# FERHENGÊ

# *Dimilî(Zazakî) û Kurmancî* (A-a)

**Seîd VEROJ**

| **DİMİLÎ** | **KURMANCÎ** |
|---|---|
| **a: 1.** Sey gelek alfabanê ziwananê bînan kirdî de zî tîpa vernî ya alfaba ya. **2.** Nîşana hayret û gazî ya. *A! çiqas rind a. **3.** Bêro pey qisan mana makîyêya ê qisan nîşan dana. * Şew**a** tarî. Dar**a** girde. **4.** Bêro vernîda namanê kerdoxan ê zemîran mana wayîr bîyayişê dana. ***A** mi, **a** to, **a** jê/ja, **a** zana. **5.** Fiîla alîkar a. * Namey keynada mi Delal a. Ez mamusa ya. **6.** "**a**" bêro vernîya qorî zerfan(pronavan) dereca ênan hera kena. * Ver/ **a**ver, pey/**a**pey, cêr/**a**cêr, cor/ **a**cor. **7.** Vernîya tayê kelîman de bêro bena fiîla alîkar, sey *ve* ya kurmacî ya. * **A**kewtiş/**ve**ketin, **a**biyayiş/ **ve**bûn, **a**qetnayîş/ **ve**qetîn. | **a: 1.** Wekî gelek alfabeyê zimanên dinyayê, di kurdî de jî tîpa yekemîn a alfabê ye. **2.** Nîşana hayret û gazî ye. *A! çiqas rind e. **3.** Bi daçekî were dawîya gotinê, mana mêyitiyê dide wê. **4.** Were pêşîya pronavê kirdewarê mê, mana xweyîbûnê dide. * A min, a, te, a wan. **5.** Ji ew tiştê ku meriv naxwaze levzê wî bigre devê xwe, di şûna wî da tête karanîn. * Filan kes **a** nebûyî di serê wî da hatiye. **6.** Di dawîya hinek kelîman da têt û wî wesfî di wan da rave dide, yanî wan digewirîne xwedan rengdêr. *Zanîn/zan**a**, xwendin/xwend**a**, westin / west**a**. |
| **aa:** bêro vernîya cumleyan mana nîda dana ay cumle. *Aa! eno hawa bî? | **aa:** were pêşîya hevokê mana nîdayê dide. * aa! bi vî hawayî bû? |
| **aba:** yew bêj xeftanê) piragirewtişî. | **aba:** celebek qeftanê lixwekirinê. |
| **Abbasî:** barixa Abbas bîn Abdulmutalîb î, ke Iraq û Misir de xelîfetî kerda. | **Abbasî:** albata Abbas bîn Abdulmutalîb e, ku di Iraq û Misrê de xelîfetî kirîye. |
| **abêna:** bîyayişeya têkilîya cinsî. | **nîya:** çêbûna têkilîya cinsî. |

| | |
|---|---|
| bw. dena, nîya. | |
| **abênayîş:** têkilîya cinsî de livê carmêrdî. bw denayîş, nayîş. | **nîyan:** di têkilîya cinsî de livandina mêr. |
| **abênaya (e):** cenîya ke bi reyde têkilîya cinsî bîya. | **nîyandî:** jina ku bi wê re têkilîya cinsî bûye. |
| **abirr:** çîyo ke tûmî ra ameyo abirrnayîş. | **vebirr:** tiştê ji tûmî jêvebûye. Bn. beş. |
| **abirrnayîş:** ganî yan zî merde, cêrakerdişeya du (di) çiyan. * Gede şit ra abirrna.* Bizê xo bol ra abirrnayê. bw. aqitnayîş. | **vebirrîn:** ganî yan jî mirî, jihevkirina du tiştan. *Zarok ji şîr vebirrî. * Bizin ji kerî vebirrîn. bn. veqetandin. |
| **abirryayîş: 1.** Cêra biyayişêya du çiyan. **2.** Vindertişê varayişê varanî. | **hatin vebirrîn: 1.** Jihevbûna du tiştan. **2.** Rawestina barîna baranê. |
| **abîyayîş:** hereketê tersê bîyayîşê. *Abiyayişê berî. | **vebûn:** hereketê bervajî bûyinê. *Vebûna derî. |
| **a bîne:** bw. ay bîne, a bîn. | **ew a dî:** nîşandana tiştê duyemîn. |
| **a bînê:** bw. ay bînên. | **ewan ê din:** nîşandana piranîya tiştên duyemin. |
| **abîşew:** şewa verê emşewe. | **şeva çuyî:** şeva berê îşev. bn. şeva bûhûrî. |
| **abîşewên:** çiyo ke yew şew verê ra mendo. | **bermayê şeva çuyî:** tiştê ku ji şeva çûyî maye. |
| **abîterşew:** du (di) şewî verê emşewe. bw. bînterşew. | **bînterşev:** du şev berê îşevê. bn. şevtira dî. |
| **abîterşewên:** çîyo ke verê du (di) şewan ra mendo. | **bermayê bînterşev:** tiştê ku bermayê du ra şev berê be. |
| **abr:** zê keleke û wirdêkê kelek o. | **abr:** wek kelekê û piçuktirê wê ye. |
| **abre:** giraneya firaqê ke yew çî tede bêro setiş. | **abrê:** giranîya firaqê ku tişt têde hatibe wezandin. |
| **abrik:** wirdêkê abrî yo. | **abrik:** piçuktirê abrê ye. |
| **aborî:** bw. ekonomî, îqtîsad. | **aborî:** bn. ekonomî, îqtîsad. |
| **abuhawa:** bi eno hawa. | **bi vê hawayê:** |
| **abû:** ay çîyo ke biyo. | **a bû:** ew tiştê ku bûye. |
| **abû hawa:** bi eno hawa. | **abû hawa:** bi vî hawayê |
| **abû Homay:** bi ya Homay. | **abû xwedê:** bi ya Xwedê. |
| **abû gore:** bi enî gore. | **abû gore:** bi vî gorê. |
| **abûqat:** bw. wekîl. | **abûqat:** bn. bergir, wekîl. |
| **abûqateye:** bw. wekîleye. | **abûqatî:** bn. bergirî, wekîlî. |
| **abûqat bîyayîş:** keso ke tahsîlê abuqatî bikero. 2. Ayo ke sewbîna mêrdiman bipawo. | **abûqat bûyin:** kesê ku xwendina abuqatî biqedîne. 2. Ew ê ku bergirîya yekê dî bike. |
| **abûqatey kerdiş:** keso ke îşê abuqatê bikero. | **abûqatî kirin:** kesê ku îşê abuqatî bike |
| **abûqat girewtiş:** qabê yew dawarê | **abûqat girtin:** ji bo dawekî tayînkirina |

| | |
|---|---|
| wekîl tayîn kerdiş | wekîlekî. |
| **abûr: 1.** Koç kerdişê teyr û tebûran ref bi ref. **2.** Cay lîçikan. * Abûrê lîçikandê mi rind nîyo. | **abûr:** koçkirina teyr û tebûran ref bi ref. |
| **abûr bîyayîş:** koç biyayişeya teyr û tebûran. | **abûr bûn:** koçbûna teyr û tebûran. |
| **abûrî: 1.** Ay teyrê ke koçber benê. **2.** Yew tewir qertel | **abûrî:** ewan teyrên ku koçber in. |
| **abû semed:** bi eno semed. | **ji ber vê(vî):** |
| **Acem: 1.** Namê Îranijan. **2.** Mûzîkê Tirkî de namê yew perdî û meqamî. | **Acem: 1.** Navê Îranîyan. **2.** Di mûzîka Tirkî de navê perde û meqamekî. |
| **acemî: 1.** Yewdo ke newe dest bi yew karî biko û xerîbê ay karî bo. | **acemî: 1.** Kesê ku nû dest bi karekî bike û xerîbê wî karî be. |
| **acemî bîyayîş:** vera yew karî xerîb û xam bîyayîşê. | **acemî bûyin:** hemberê karekî bîyanî û xam bûyin. |
| **acemiyê:** vera yew kar û weziyetî xerîb û xam biyayişê. | **acemîtî:** hemberê karekî rewşa bîyanî bûnê. |
| **acemiyê kerdiş:** | **acemîtî kirin:** |
| **acêba:** bw. gelo. *Acêba geda ameya keye? | **acêba:** bn. gelo. * Acêba zarok hatîye malê? |
| **acêba giran:** bîyayişê yew çî ke nêpawyeno. | **acêba giran:** tiştê ku çêbûna wî ne normal be. |
| **acêb mendiş:** nêpawitişê çîyêk bêwextî. | **acêb mayin:** li hember çêbûna tiştekê bêwext şaş mayin. |
| **acêr:** hetê cêrî, ver bi cêr. | **jêr :** bervajê jor. |
| **acêr bîyayîş:** bw. seracêr biyayîş. | **berjêr bûn:** bn. serjêr bûn. |
| **acêr de (di ):** cêr de. | **di jêr de:** |
| **acêr de akerdiş:** | **di jêr de vekirin:** |
| **acêr de diyayîş:** | **di jêr de dîtin:** |
| **acêr de mendiş:** | **di jêr de mayin:** |
| **acêr de vengdayîş:** bw. cêra vengdayiş. | **ji jêr ve bangkirin:** |
| **acêr de vengdiyayîş:** | **jêr ve hatin bangkirin:** |
| **acêr kewtiş:** hetê cêrî de mendiş. | **berjêr ketin:** ji aliyê jêr ve mayin. |
| **acêr ra:** | **ji jêr ve:** |
| **acêr şîyayîş:** | **berjêr çûyin:** |
| **acib:** bi zerrba kê bîyayîşiya yew çî. | **acib:** bi dilê me bûyina tiştekî. |
| **acibna:** hetê yewî ra acibnayişeya yew çî. | **aciband:** ji alî yekî ve acibandina tiştek. |
| **acibnayiş:** bi zerba kê bîyayîşê yew çî. | **acibandin:** begem kirina çêbûna tiştekî. |
| **acibyaye (a):** çiyo ke bi asayişê xo ameyo erê kerdiş**.** | **acibandî:** tîştê ku bi çêbûna xwe erênî hatîye dîtin |
| **aciz:** zerrteng, nerehet. | **aciz:** nexoş, nerehet. |
| **aciz bîyayîş:** bw. zerrtengeye kerdiş. | **aciz bûyin:** xweş nedîtina çêbûna hereketek yan jî tiştekî din. |

| | |
|---|---|
| **acizeye:** bw. zerrtengeye. | **acizî:** nexoşî, nerehetî, kesê ku aciz bûye. |
| **acizê bîyayîş:** zerrtengeye biyayîş. | **acizî bûyin:** diltengî bûyin. |
| **acizê kerdiş:** zerrtengeye kerdiş. | **acizî kirin:** diltengî kirin. |
| **aciz kerdiş:** zerrteng kerdiş. | **aciz kirin:** dilteng kirin. |
| **aciznayîş:** aciz kerdiş. | **acizandin:** aciz kirin. |
| **acizyaye(a):** keso ke aciz bîyo. | **acizî bûyî:** kesê ku aciz bûye. |
| **acizyayiş:** zerrteng bîyayîş. | **acizbûn:** dilteng bûn, nexoş ban. |
| **acor:** ver bi cor. | **berve jor:** ber bi jor ve. |
| **acor bîyayîş:** ver bi cor bîyayîş. | **berjor bûyin:** ber bi jor bûyin. |
| **acor de:** bw. cor de. | **li jor de:** |
| **acor de abîyayîş:** | **li jor de vebûn:** |
| **acor de akerdiş:** | **li jor de vekirin:** |
| **acor de dîyayîş:** | **li jor de dîtin:** |
| **acor de mendiş:** | **li jor de mayin:** |
| **acor de vindertiş:** | **li jor de sekinîn:** |
| **acor kerdiş:** ver bi cor kerdiş. | **li jor de kirin:** ber bi jor de kirin. |
| **acor kewtiş:** | **li jor ketin:** |
| **acor şîyayîş:** ver bi cor siyayîş. | **ber bi jor de çûyin:** |
| **acor ra:** hetê corî de. | **ji jor va**: alîy jor de. |
| **acûr [1]:** lat. cacumis. bw. bejik, qitik. | **ecûr:** lat. cacumîs. bn. tehlîşik, tirozî. |
| **acûr [2]:** yew bêj qitî. | **acur [1]:** celebek ji qitîyan. |
| **acûr [3]:** kîremît. | **acur[2]:** kîremît. |
| **acûrpewj:** (ayo) we keso ke acuran pewjeno. | **acurpêj:** ew kesê ku acuran (kîremîtan) dipêje. |
| **açarna:** kes yan zî çîyêk apey erşawitiş, agêrnayiş. | **vegerand:** kesekî yan jî tiştekî şûnde şandin. bn. zîvirand, dagerand. |
| **açarnayîş:** kes yan zî çiyêk peyser tadayîş. | **vegerandin:** kes yan zî tiştekî şûnde şandin. |
| **açaryayîş:** agêrayîş, peyser ameyîş. | **hatin vegerandin:** |
| **açaryaye(a):** kes yan zî çîyo ke peyser berşawyo. | **vegerandî:** ew kes yan jî tiştê ku şûnde bête şandin. |
| **açî:** ziwanê gedan de pirodayîş. | **açî:** di zimanê zarokan de lêxistin. bw. eç. |
| **açî bîyayîş:** ziwanê gedan de pirodyayîş. | **açî bûyin:** di zimanê zarokan de hatin lêxistin. |
| **açî kerdiş:** bw. açî kerdene. | **açî kirin:** di zimanê zarokande lêxistin. |
| **açînaye:** *May mi herunda gojak açînaya. bw. vawitiş. | **veçinî:** *Dêya min şûna pişkovê veçinî. |
| **açînayîş:** deştena herunda gojake. | **veçinîn:** diruna şûna pişkovê. |
| **ad:** bw. ahd, sowend. | **ad:** bn. sond. |
| **ad kerdiş:** bw. sowend werdiş. | **ad kirin:** bn. sond xwarin. |
| **ad û wad bo:** bi soz û sowend bo. | **ad û wad be:** bi sond û soz be. |
| **ad û wad kerdiş:** soz û sowend. kerdiş. | **ad û wad kirin:** sond û soz dayin. |
| **adar [1]:** bw. awdar. | **adar [1]:** bn. avdar. |

| | |
|---|---|
| **adar [2]:** namê yew vilika wesarî. | **adar [2]:** navê kulîlkek biharê. |
| **adaşt:** cayo asaye yo durê ma. | **wêda:** ciyê xuya yê durê me. |
| **adaşt biyayîş:** kêra dûrî biyayîş. | **wêda bûyin:** ji me dûr bûyin. |
| **adaşt de:** | **di wêda de:** |
| **adaşt kewtiş:** tay durî kewtiş. | **di wêda ketin:** hinek dûr me. |
| **adaşt ra:** | **ji wêda ve:** |
| **adaşt ra ameyîş:** dûrî ra ameyîş. | **ji wê da ve hatin:** ji dûr ve hatin. |
| **adaşt vistiş:** dûrî vistiş. | **wêda avêtin:** |
| **adalet:** farazîye yê ke hetê tebaxa wayîrê hêz yan jî îqtîdarî ra amey peydakerdiş û şert kerdiş. | **adalet:** farazîye yên ku ji layê çîna xwedî hêz an jî desthelat ve hatine pêkanîn û pêdivîkirin. bn. dad, dadmendî. |
| **adalet ardiş ca:** | **adalet bicî anîn:** |
| **adalet gêrayîş:** | **adalet gerîn:** |
| **adalet vilakerdiş:** | **adalet belakirin:** |
| **adalet vînayîş:** | **adalet dîtin:** |
| **adalet waztiş:** | **adalet xwestin:** |
| **adamaqlî:** çiyo ke bîyayîşeya yê hewce û misteheq bo. | **adamaqlî:** tiştê ku bûyina wî hewce û di cî da be. |
| **adil:** yewdo ke wayîrê adaletî bo. | **adiîl:** kesê ku xwedî adaletê be. |
| **adilî:** adalet çarnayîş. | **adilî:** adelet gerandin. |
| **adilane:** îşo ke bi adalet bo. | **adîlane:** îşê ku bi adalet be. |
| **adirok:** *lat. anthemis.* Yew bêj vaş. | **beyare:** *lat. anthemis.* Cûrekî gîya. |
| **adirokê zerencan:** *lat. arum.* Yew bêj vaş. | **kişnîg:** *lat. arum.* Cûrekî gîya. |
| **adirokê heşe:** *lat. crîthmum.* Yew bêj vaş. | - |
| **adet:** *Adetê ma, adetê baw û bawkalan î. | **adet:** * Adetên me, adetên bav û kalan in. bn. ûrf. |
| **adetî:** çîyo ke bîyayîşê yê adet ra bo. | **adetî:** tiştê ku bûyina wê ji adetê be. |
| **adet ra kewtiş:** | **ji adetê ketin:** |
| **adet ra vejyayîş:** adetan ra teber hereket kerdiş. | **ji adetê derketin:** ji derê adetan hereket kirin. |
| **adilnayîş:** bw. vindarnayene. | **sekinandin:** sekinandina livê, bêhereket mayin. bn. rawestandin. |
| **adim kerdiş:** bw. lewitnayîş, herimnayîş. | **adim kirin:** bn. lewitandin. |
| **adimyayîş:** xirab bîyayişê û herimyayişêya çîdêk. | **adimîn:** xerabûn û herimîna tiştekî. |
| **adir:** bw. ataş. | **agir:** bn. ataş. |
| **adir bîyayîş:** adir girewtişeya yew çî. **2.** Zaf hêrs bîyayîş. | **agirbûn:** **1.** Agir girtina tiştekî. **2.** Zaf hêrs bûyin. |
| **adir dekewtiş:** adir bi cayêk kewtiş. | **agir pê ketin:** agir pê ketina cîyekî. |
| **adir deviştiş:** adir panayîşê yew çî. | **agir vêxistin:** agir pêxistina tiştekî. |
| **adirên:** çîyo ke adir ra bo. | **agirî:** tiştê ku ji agir be. |

| | |
|---|---|
| **adirgan:** kûçlan. | **agirgan:** tifik. |
| **adir gij biyayîş:** bw. adir girr biyayîş. | **agir gurr bûn:** |
| **adir gij kerdiş:** bw. adir gurr kerdiş. | **agir gurr kirin:** |
| **adir girewtiş:** adir tebîştiş. | **Agir pê girtin:** |
| **adiro girr:** *Yew adirdê girrî vera | **agirê gurr:** *Kes ji ber agirê gurr nêremeno nareve. |
| **adir hewnakerdiş:** | **agir vemirandin:** |
| **adir kerdiş:** bw. adir panayiş. Adir qirman de maneno. | **agir kirin:** * Agir di quraman de dimîne. * |
| **adirî mendiş: 1.** Adirê jê bîyayîş. **2.** Zaf pêt biyayîş, bi liv biyayîş. | **mîna agir:** zaf bi hêz bûyin, bi liv bûyin. |
| **adir panayîş:** bw. adir acifnayîş. | **agir pêxistin:** bn. agir vêxistin. |
| **adir peysnayîş:** bw. adir hewna kerdiş. | **agir vemirandin:** |
| **adir peysiyayîş:** bw. adir hewna biyayîş. | **agir vemirin:** bn. agir tefandin. |
| **adir tebîştiş:** adir girotiş, adir biyayîş. | **agir girtin:** agir vêketina tiştekî. |
| **adir tefênayîş:** bw. adir peysnayîş, adir miraynayiş. | **agir tefandin:** bn. agir vemirîn. |
| **adir temirnayîş:** *Adirê kuçlanan germ o, erey serd beno. | **agir temirandin:** * Agirê kuçlana germ e, dereng sar dibe. |
| **adir û alawî:** * Adir simer ra na, xo da vay ver. | **agir û alavî:** bn. agir û pêtî * *Agir berda, kayê xo da ber bayê. |
| **adir û pîya bîyayîş:** sivik hereket kerdiş, zaf aktîv bîyayîş. | - |
| **adir û şewate dekewtiş:** | **agir û şewat pêketin:** bn. agir û pêtî pêketin, agir û şewat pêketin. |
| **adir û şewate:** | **agir û şewat:** |
| **adir varayîş: 1.** zaf germ biyayîş **2.** zaf vayê biyayîş. | **agir barîn:** zaf germ bûyin. *Agir berda, |
| **adir varnayîş:** zaf vayê kerdiş. | **zaf buhayî bûyin:** bn. agir barandin, zaf bûhayî kirin. |
| **adirvaş:** yew bêj vaş o ke weryeno. | – |
| **adir weş biyayiş:** | **agir xweş bûyin:** |
| **adir weş kerdiş:** | **agir xweş kirin:** |
| **adire:** yew nêweşeya çermî. | **agire:** nexweşîkî çermî. |
| **adirgan:** bw. kûçik, kûçlan. | **agirdan:** bn. kûçik, tifik. |
| **adirge:** yew perçê asinî yo, bi ssî ro danê ke pê adir bigîro. | **danê kevirheste:** perçekî hesin e, li sîyê dixin ku pê agir bigre. |
| **adle:** bw. hag *Haga hengûr. | **zembîl:** zembîla mezin ya tirî. |
| **adu:** bw. bela | **adu:** bn. bela. |
| **adu biyayîş:** bw. bela biyayîş. | **adu bûyin:** bn. bela bûyin. |
| **ada kerdiş:** | **adu kirin:** bn. bela kirin |
| **aja:** bw. aca, ewca, ewra. | **wê da:** li wê derê |
| **aja de:** bw. ewra de. | **li wê derê de:** |

| | |
|---|---|
| **ajore:** bostan yan zî rezo ke şên bibo û bar nêgîra. *Emsar rezê ma ajore biyo. *Bostanê ma ajore biyo. bw. Porik. | **gewî:** bostan yan jî rezê ku şên û geş bibe û ber nede. *Îsal rezê me gewî bûye. *Bostanê me gewî bûye. |
| **ajore biyayîş:** nêweşiya ajore biyayîşê. | **gewî bûyin:** bi nexweşîya gewî ketinê. |
| **abî:** *şewa tarî bî, berê ma bi xovera abî. | **vebû:** * şeva tarî bû, derîyê me ji xwe ve vebû. |
| **abiyaye:** bw akerde. | **vekirî:** |
| **ake:** halê emirdayîşê akerdişî yo. | **veke:** halê emirdayina vekirinê *ye.* |
| **akerde:** bw. abiyaye. | **vekirî:** |
| **akerdiş:** bw. akerdene. | **vekirin:** *derî vekirin. |
| **Akinciyan:** namê yew dewa ke bi Dîyarbekir ra girêdaye ya. | **Akinciyan:** navê gundekî ku Dîyarbekirê ve girêdayî ye. |
| **Akrag:** yew mezra Pîranî ya ke Bi dewa Bazbend ra girêdaye ya. | **Akrag:** navê mezrakî ku bi Bazbendê va girêdayî ye. |
| **akewt:** vejyayişê rojî yan zî aşme * Roj akewt. * Aşm akewte. | **helat:** derketina rojê. * Roj helat, * Hîv hilhat. |
| **akewtiş:** *akewtişê rojî vîst û çiyer seetan ra ray beno. | **helatin:** * helatina rojê ji bîst û çar seetan carekî çê dibe. |
| **albane:** yew bêj def a. | **albane:** celebekî defê ye. |
| **alabazar:** bazareya ser û vera.. | **alabazar:** kesê kû bazarîya ser û bera. |
| **Alduş:** namê Gergerî yo verên. | **Alduş:** navê Gergerê yê berê. |
| **alafiranga:** bi hawa û adetê awrupa. | **alafiranga:** bi hawa û adetên awrupayî . |
| **alalo:** bw. qurt, şamlî. | **elelo:** celebek heywanê kedî kirî. |
| **alman:** şaro ke nijadê Cermennan ra bo û ay keso ke enî şarîra bo. | **alman:** ji nijadê Cermenan xelkekî û ew kesê ku ji vî xelkî be. |
| **almanî:** yew ziwanê Hind-Awrupa û şaxê Cermenî *yo,* ke Almanya, Awistirya û tay cayandê Îswîçre de yeno qisey kerdiş. **2.** Ziwano ke Alman qisey keno. | **almanî:** zimanekî Hind-Awrupayî û şaxek ji zimanê Cermen e, ku Almanya Awistirya û li hinek herêmên Îswîçre diaxfin. **2.** Zimanê ku Alman pê diaxife. |
| **Almanya:** welatê Almanan. | **Almanya:** welatê Almanan. |
| **alan:** dor û norê Dêrsim û Pîranî de namê yew eşîre. | **alan:** di der û dora Dêrsim û Pîranê de. navê eşîrekî. |
| **alaqe:** nizdîyê. | **alaqe:** kar û barê ku meriv pêra bête girêdan. bn. nêzîkayî |
| **alaqedar:** bi kar û barêk ra girêdyayiş. | **alaqedar:** bi kar û barekî ve hatin girêdan. |
| **alaqedar biyayîş:** nizdiyey bîde nawitiş. | **alaqedar bûyin:** |
| **alaqedarê:** | **alaqedarî:** |
| **alaqedar kerdiş:** | **alaqedar kirin:** |
| **alaqnayîş:** bw. leqnayîş. | **daleqandin:** bn. aleqandin. |
| **alaqnaye:** çiyo ke ameyo leqyayiş. | **daleqandî:** tiştê ku hatîye daleqandin. |
| **alaqnayox:** ay keso ke çî alaqneno. | **daleqandker:** ew kesê ku tişt dadileqîne. |

| | |
|---|---|
| **alawitiş:** *Mîr alawitiş. bw. lalitiş. | **helatin:** *Hevîr helatin. |
| **alawî**: kila adirî. | **pêt:** bn. xurî, rivîn. |
| **alawî biyayîş:** kil girotişê adirî. | **pêt pê girtin:** pêt pê ketina |
| **adir û alawî girotiş:** ben. kil girotiş. | **agir û pêt pê girtin:** bn. xurî pê ketin. |
| **alawî kerdiş:** bw. alawî devistiş. | **pêt pê daxistin:** |
| **alawî bide kewtiş:** | **pêt pê ketin:** bn. rivîn pê ketin. |
| **alawî panayîş:** kil panayîş. | **pêt pê xistin:** rivîn pê xistin. |
| **alatexmîn:** veynayîşo bêhikûm. | **alatexmîn:** dîtina bêhikûm, bêbiryar. |
| **alatrîk:** bw. kehreb, ceyran. | **kehreb:** bn. elektrik. |
| **alaturka:** bi hawa û adetê Tirkan. | **alaturka:** bi hawayê û adetên Tirkan. |
| **alb:** firaqo darin ke bi qûlp a. bw. elb. | **elb:** firaqek darîn ku piranî bi çembil e. |
| **albik:** hurdêkê alb a. | **elbik:** piçukê elbhesk e. |
| **alef:** têpîze de werê heywanan. | **alef:** bn. put. |
| **alet:** **1.** Çiyo ke pê gûre beno; gaz, Aleta cit. bw. halet, hangaj. | **alet:** **1.** tiştê ku pê îş tê dîtinê: kondêz... **2.** gaz, hesk... **2.** Berûabu |
| **afat:** bw. felaket. | **afat:** bn. felaket. |
| **afat biyayîş:** bw. felaket biyayîş. | **afat bûyin:** bn. felaket bûyin. |
| **afat kerdene:** bw. felaket kerdiş. | **afat kirin:** bn. felaket kirin. |
| **afara:** 1. Gend û gemara ke bindê ciwênî de mano. **2.** Gedê keyî yo peyên. | **efara:** **1.** Gend û gemara ku di binê bênder da mayî ye. **2.** Zarokê malê yê dawîn. |
| **afara biyayîş:** | **efara bûyin:** |
| **afara kerdene:** | **efara kirin:** |
| **aferîn:** emir derg biyayîş. | **aferîn:** emir dirêj bûyin. |
| **afirnayîş:** bw. fijitiş, pelaxnayîş. *Hengûr efirnayîş. | **pelaxtin:** bn. eciqandin. |
| **afirya:** bw. fijiya, pelaxya. | **pelixî:** bn. eciqî. |
| **afiryaya (e):** çîyo ke afiryayo. | **pelixî:** tiştê ku pelixîye. |
| **afiryayene:** fijityayîş, palixyayîş. | **pelixîn:** |
| **afiyet:** nanî sero yan zî nan werdişî ra pey vajyena û yena ena mana; çîyo ke ti wenê gandê to de bihelyo. | **afiyet:** tiştê ku tu dixwî pê cîkî te neêşe, hinava teda bihele. bw. noşîcan, jîyan. |
| **afiyet bo:** | **afiyet be:** bn. noşîcan be, jiyan be. |
| **afo:** vera jew sucdarî bexş biyayîş. | **afo:** hemberê sucdarîyekê bexş bûyin. |
| **afo biyayîş:** bw. bexş biyayîş. | **afo bûyin:** bn. bexş bûyin. |
| **afo kerdiş:** bw. bexş kerdiş. | **afo kirin:** bn. bexş kirin. |
| **afyon:** ay şito ke xaşxaş ra nesi ilyeno û kê pê serxoş benê. | **afyon:** ew şîrê ku ji xaşxaşê dinesile û mirov pê serxoş dibe. |
| **afyonkêş:** keso ke afyon kaşbiko. | **afyonkêş:** kesê ku afyon bikşîne. |
| **afyonkêşeye:** îşê afyon kaşkerdişeye. | **afyonkêşî:** îşê afyon kaşkirinê. |
| **aga:** derheqtê yew çî de wayirê malumat biyayişî. * Elm û aga mi bi ameyiştê to çinya. | **aga:** di derheqê tiştekî de xwedî malumat bûyinê. *Elm û aga min bi hatina te tune ye. |
| **agadar:** bw. xeberdar, pê hesyayiş. | **agadar:** bn. xeberdar, pêhesîn. |

| | |
|---|---|
| **agadar biyayîş:** bw. xeberdar bûyin. | **agadar bûyin:** bn. xeberdar biyayîş. |
| **agêrayîş:** bw. açaryayiş. peyser ameyîş. | **vegerîn:** di çuyina rêkî da şunda hatin. |
| **agêrnaye (a):** açarnaye. | **vegerandî:** şûnde hatî, zivirandî. |
| **agêrnayîş:** bw. açarnayîş. | **vegerandin:** di rêya çûyinê de bi paş ve hatin zivirandin, |
| **agêryayîş:** peyser ameyîş. | **hatin vegerîn:** ji alî yekê din ve hatin zivirandin. |
| **agît:** bw. egît, mêrxas. | **egît:** bn. mêrxas. |
| **agîtî:** agît biyayene. | **egîtî:** egît bûyin. |
| **agoz:** bw. nesil, parzûn kerdiş. | **palav:** bn. nesil, parzûn kirin, paravtin. |
| **agozna:** îşê agozê kerdiş. | **palavt:** parzun kir, zelal kir. |
| **agoznaye (a):** çiyo ke ameyo parzûn kerdiş. | **palavtî:** tiştê ku hatîye parzûn kirin. |
| **agoznayîş:** parzûn kerdiş. | **palavtin:** îşê parzûn kirinê. |
| **agozyayîş:** | **hatin palavtin:** |
| **ahbab:** kesê ke hetê civakî ra pêra têkilîya nizdî viraziyo. | **ahbab:** kesê ku ji alî civakî ve pêre têkiliyên nêzîk bêne danîn. |
| **ahbabê:** bi yewnay ra bîyayîşê tikilîda nizdî. | **ahbabî:** bi yekê din ra hebûna têkiliyên nêzik. |
| **ahbabê biyayîş:** | **ahbabî  bûyin:** |
| **ahbabê kerdiş:** | **ahbabî kirin:** |
| **aheng:** pêmendişê û pêameyişeya di çiyan. | **aheng:** lihev hatin û mînanê hev bûyîna du tiştan. |
| **ahlaq:** | **ahlaq:** |
| **ahmeq:** kemaqil, xînt. xêv. | **ahmeq:** bn. xînt. xêv, kêmhiş. |
| **ahmeqê:** kemaqilê, xîntê. xêvê. | **ahmeqî:** bn. xîntî, xevî, kêmhişî. |
| **ahmeqê biyayîş:** | **ahmeqî bûyin:** |
| **ahmeqê kerdiş:** | **ahmeqî kirin:** |
| **ajel:** heywanê ke keye de weye bibî. bw. destî, keyî, kedî. | **kedî:** heywanê ku di mal da bêtin xweyî kirin. bn. kedî. |
| **Alewî:** keso ke bi mezhebdê Alawîyê ra girêdaye bo. | **Alewî:** kesê ku bi mezheba Alewîtîyê ve girêdayî be. |
| **alêl:** bw. qertel. | **wirxal:** bn. qertel, hulî. |
| **alikan:** bi Çolemerîk ra girêdaya namê dewêke. | **alikan:** bi Çolemerîkê ra girêdayî navê gundekî. |
| **alimnayîş:** bonder kerdişêya yew çî. bw. musnayîş. | **elimandin:** hînbûna tiştekî. bn. hînkirin |
| **alimyayîş:** îşê bonder biyayişêya yew çî. bw. musnayîş. | **elimîn:** îşê hînbûna tiştekî. bn. hînbûyî. |
| **alimyaye:** keso ke bonderê yew çî biyo. | **elimî:** kesê ku hînê tiştekî bûye. bn. hînbûyî. |
| **alişk:** * Dapîr mi lew naye alişkda mi ra. | **gep:** *Dapîra min ramusanekê li gepa min da. |

**aloznayiş:** bw. helisnayîş, riznayîş, pûç kerdiş, xeripnayîş, qesnayîş. *Vilînceyê mi alozya *Firingî ma helisyayî. *Gozê ma pûç bî. * Toraqê ma qesya.
**alozyaye:** bw. helisyaye, rizyaye, xeripyaye, qesyaye.
**alozyayîş:** pûç yan zî xeripyayişêya yew çî.
**alî:** bw. teraf, het, kinar, paştî.
**alî dayîş:** bw. paştî dayîş.
**alî girotiş:** teraf girotiş, paştî girotiş.
**alîkar :**keso ke îşê a lîkerdiîşî biko.
**alî kerdiş:** bw. teraf girotiş.
**alîkeyf:** bw. ehlîkeyf.
**alîm:** bw. zanaye.
**Alîsor:** *lat. ptrus.* Yew bêjê mirweyan.
**allu:** bw. alluy.
**allu rokerdiş:** semedo ke yew kar hîna rew bikê qisêyek a, ke qabê gedanê yena vatiş. bw. hî û zûwa.
**alluy qult kerdiş:**
**almast:** yew bêj maddeno bi qîmet o.
**alox:** mîndero ke fînenê cildê heran yan zî estoran ver. bw. vermane.
**altun**(Au)**:** yew bêj maddeno bi qîmet o. * Altun wûrdêk o, qîmetê yê vêşî yo. bw. zerr.
**altunaw:** awa altunî..
**altunên:** çiyo ke altun ra virazyayo. bw. zerrên.
**alûç:** *lat. prunus.* yew bêj fêkî. bw. alûnçe.
**alûçêr:** dara alûçe.
**alwe:** bizêko ke bilewo fekdê yê ra darêk girêdanê, ke enî darî ra vajyeno “alwe”. bw. lewtik.
**alwe bîyayiş:**
**alwe kerdene:**
**ame:** waya pî. bw.bîbî, xalê.
**amiza:** lajê ame.
**amkeyna:** keyna amê.
**amaje:** dara serdê berî. bw. serber.
**aman:** 1. Yena mana ardim waştişî.

**alozandin:** **1.** bn. helisandin, rizîn, pûç kirin. *Benîştê min alozî. * Balîcanê me yên sor helisîn. * Gozê me pûç bûn. * Toraqê me qûsyaye.
**alozî:** bn. helisî, pûç, pûçerax, pûç, rizî.
**alozîn:** pûçbûn yan jî xeripîna tiştekî.
**alî:** bn. teraf, pişt.
**alî dayin:** bn. pişt dayin.
**al îgirtin:** teraf girtin, pişt girtin.
**alîkar :**kesê ku îş ê alîkirinê bike.
**alî kirin:** bn. teraf girtin.
**alîkeyf:** bn. elhîkeyf.
**alîm:** bn. zana, zanyar.
**alîsor:** *lat. ptrus.* Cûrekî hirmîyan.
**avdev:** bn. xwîzî, xazî.
**şilûza:** ji bo ku karekî zutir çê bibe, gotinekî ye ku ji bo zarokan tête gotin. bn. şil û zuha.
**avdev-xwizî daqurtandin:**
**almast:** celebek maddenê giranbiha.
**alox:** cilikê ku davêjin ber kûrtanê keran yan jî hespan.
**zêr**(Au)**:** cûrekî maddenê giranbi- * Zêr biçûk e, biha giran e.
**zêrav:** ava zêr.
**zêrîn:** tiştê ku ji zêr çê bûye.
**alûçe:** *lat. prunus.* fêkiyek. bn. arûk, hilûzerk, şilor.
**dara alûçe:** dara ku fêkîya alûçê digre.
**bizmik:** karikê ku bimêje bi devê wan ra darekî tête girêdanê ku ji wê darê dibêjin *bizmik.*
**bizmik bûn:**
**bizmik kirin:**
**met:** xwişka bav. bn. bîbî.
**lawmet:** lawê metê.
**qîzmet:** qîza metê.
**serder:** dara ser derî.
**aman:** 1. tête mana alîkarî xwestinê.

*Aman gidîno! **2.** Yena mana afo wastişî. *Aman, ez rayna nêkena. **3.** Yena mana rica kerdişî. *Aman enwa mekê! **4.** Yena mana hêrs û aciz biyayişê. *Aman mi verad! **5.** Yena mana bal kaşkerdişeye. * Aman, baş gedî bewnînê!
**ambar:** cay kermer dekerdişî bw. hambar.
**ame:** *Meyman bi hestor ame.
**Amedye:** Başûrê Kurdistanî de namê yew qeza.
**amel:** bw. bawerî.
**amel bide ardiş:** bw. bawerî bide ardiş.
**amel biyayîş:** bw. bawer biyayîş.
**amele:** bw. pale, karker, zahmetkêş.
amele bîyayiş: bw. pale, karker û zahmetkêş bîyayîş.
**amel kerdişx:** bw. bawer kerdiş.
**ameleyê:** îşê amelyê.
**ameleyê kerdiş:** keda xo rotiş.
**amelet:** hetê doxtorî ra mûdaxale kerdişê birrnayîş û newera deştişêya birîna yew nêweşî.
**amelet biyayîş:**
**amelet kerdiş:**
**ameye:** keso ke yewna cara ameyo cayo newe. *Pî mi Mahabad ra ame.
**ameyene:** bw. ameyîş.
**ameyene pêser:** **1.** Ameyîş pêser.
**ameyene ra vîr:**
**ameyene sere:**
**ameyene war:**
**ameyene xapênyîş:**
**ameyene werte:**
**ameyene vernî:**
**amên:** bw. dirişt (semedê şitî), mîraz (semedê mîrî)
**amên biyayîş:** bw. amên girotiş.
**amên kerdiş:**
**amênin:** çiyo ke amên biyo. bw. amên kerde.
**amênvaş:** namê yew bêj vaşî.
**Aminî:** Basraf ra girêdaya yew

*Aman gidîno! **2.** Tête mana alîkarî xwestinê. *Aman, ez carek dî nakim! 3. tête mana tika kirinê. *Aman wisa nekin! **4.** Tête mana aczî û hêrs bûnê. * Aman carek dî neye! **5.** Tête mana bal kêşandinê. *Aman,baş zarokan binêrin.
**ambar:** cihê alav danînê.
**hat:** *Mêvan bi hespê hat.
**Amedye:** navê qezeyek di başûrê welat de.
**amel:** bn. bawerî.
**amel pê anîn:** bn. bawerî pê anîn.
**amel bûyin**: bn. bawer bûyin.
**amele:** bn. pale, karker, zahmetkêş.
amele bûyin: bn. pale, karker û zahmetkêş bûn.
**amel kirin:** bn. bawer kirin.
**ameleyî**: îşê ameleyî.
**ameleyî kirin:** keda xwe firotin.
**amelet:** ji alî dixtor ve mûdaxala birîn jêkjrin û ji nû ve dirûtuna birîna nexweşek.
**amelet bûyin:**
**amelet kirin:**
**hatî:** kesê ku ji cîkî were ciyê nû. *Bavê min ji Mahabadê hat.
**hatin:**
**hatin berhev:** **1.** Kombûn.
**hatin bîr:** bn. Bîrhatin, bîr hanîn.
**hatin serî:**
**hatin jêr:**
**hatin xapandin:**
**hatin holê:**
**hatin pêşî:**
**amên:** bn. haveyn, maya.
**amên bûn:** bn. amên girtin.
**amên kirin:** bn. maya kirin.
**amên kirî:** tiştê ku amên bûye.
**amêngiya:** navê cûrekî giya.
**Aminî:** bi Basrafê ra girêdayî

Dewa(mezra) Pîranî.
**amnan:** çiyer demserrana namê yewe. bw. hamnan.
**amnane:** cayo ke amnanan kê şorê.
**amnanên:** çiyo ke anman ra mendo.
**amoj: 1.** We keso ke hêrs bibo, bicigiryo û bêhawa xeberî bido û mêrdim yê/ya bi qisandê weşan, lebyayişê reyde vindarno, tira vajyeno amojnî biyo.
**2.** Heywan wexto ke bi tay liv û tevgeran bêro berdestî kerdiş, tira vanê ameyo *amoj*î kerdiş. bw. amojnî.

**amoj biyayîî:**
**amoj kerdiş:**
**amsar:** serra ke kê tedey. bw. emserre.
**amsarên:** çiyo ke amsar ra mendo.
**amsare(a):** çiyo ke ena serr mîyan de biyo. *Bizêko (a) amsarre.
**amver:** ay ke emrê yên seycê bo. bw hamver. bw. hogir.
**-an: 1.** parekê vêşî kerdişê * şewan, daran, rojan, mêrdiman.
**ana:** wexto ankayên bw. anûha
**anasar:** çiyo ke enhawa bibo * Mi mêrdimo anasarên nêdî
**anaşt:** bw. naşt, enakişt, enahete, nover.
**anaşt ameyîş:**
**anaşt deyîş:**
**anaşt kewtiş:**
**anaşt ra:**
**anaşt vistiş:**
**anawa:** bw. enahawa.
**ancax:** bw. bi zor.
**ancî:** bw. fina, rayna, hewîna.
**ancîna:** raya didin. Bw. fina, rayna.
**anciyayîş:** *arda ra anciyayîş.
**-ane:** yew parek o, ke mana "-lık -lik û -lük" a tirkî dana: Roj**ane**, aşm**ane**, gişt**ane**.
**anix:** *lat. satureja.* bw. zahtire, awîşen.
**anka:** bw. anûha.
**anka ra:** ena gam r ana heta.

gundek Pîranê.
**havîn:** ji çar demsalan navê yekâ.

**havînge:** cihê ku havînan meriv here.
**havînî:** tiştê ku ji havînê maye.

**amoş: 1.** Ew kesê ku hêrs dibe, dixeyde û bêhawa xeber bide ku û meriv bi lavayî û gotinên xweş wî/wê biseknîne, tê gotin ku ew
**2.** Heywanê ku dema dotin û şîrdayinê, serhişkî bike, çêleka xwe nemijîne û nehêle bête dotin, bi hinkî tevgeran ew bête berdest kirin, tête gotin *amoş* bûye.
**amoş bûyin:**
**amoş kirin:**
**îsal:** sala ku em têda ne. bn. hemsal.
**îsalîn:** tiştê ku vê salê çêbûye.
**îsalî:** tiştê ku di nava vê salê da bûye. * Karikê îsalî.
**hevsal:** ew ên ku emrê wan wekhev be. bn. denk, hogir.
**-an: 1.** parekê pirranîyê. * Daran, şevan, rojan, mêran.
**ana:** dema nûha. bn. anûha.
**ewaha:** tiştê ku bi vê hawayê bibe. *Min merivê ewha nedît.
**vir da:** bn. rex, nik, hêl, ber.
**vir da hatin:**
**vir da dayin:**
**vir da ketin:**
**vir ve:** bn. vir da
**vir da avêtin:**
**vê hawayê:** vê şeklî.
**ancax:** bn. bi zor.
**carde:** ducar bûna tiştekî.
**carde:** car din.
**hatin kişandin:** * ji erdê ve hatin kişandin.
**-ane:** parekekî ye, ku mana "-lık, lik û * -lük" a tirkî dide: Roj**ane**, meh**ane**, Sal**ane**, gişt**ane**.
**cahtirî:** *lat. satureja.* bn. catir, merze.
**anûka:** bn. anûha.
**anûka ve:** ji vê gavê ve virde.

**ankara pey:** ena gam ra dime.
**ankara ver:** ena gam ra ver.
**ant:** bedilnayişê cadê yew çî.
**antiş: 1.** Erd ra kaşkerdişê reyd ca bedilnayîş *Ciwal erd ra antiş. **2.** Mana têkilîda cinsî ya heywanan dana. * Mayîn her ra *antiş*. **3.** Kar û bar nîşan dana. * Sap antiş. * Bîr ra aw antiş. * Pira antiş (dayiş piro). *Cixara antiş. **4.** Zeman nîşan dana. *Eno rayîr çiyer seetî anceno.
**antiş cêr:** bw. antiş war (diwar).
**antiş cor:** bw. antiş dîyar.
**antiş pêser:** bw. pêser kerdiş.

**antiş ver:**
**antîke (a):** çîyo bi qîmet û hêja.
**apey:** heta pey ser. antiş peyser.
**apey biyeyîş:** tepa mendiş.
**apey dayiş:** bw. peyser dayiş.
**apey girotiş:** bw. peyser girotiş.
**apeyser:** xeta şiyayişê de tepa agêrayîş. bw. peyser.
**apeyser ameyîş:** bw. tepa ameyîş, tepa agêrayîş.
**apeyser dayîş**: bw. tepa dayîş.
**apeyser girotiş:** bw. tepa girewtîş.
**apeyser kewtiş:** bw. tepa kewtîş.
**apeyser şiyayîş:** bw. tepa şiyayîş.
**apeyser tadayîş:** bw. tepa tadyayîş.
**aqeliş:** bw. qeliş, terk.
**aqelişya:** bw. qelişya, terka.
